# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (268):

## Revandina du sivîlên Kurd, qoprandina/destanîna ser zeytûna li "Kotana" bi qaserî nîv milyon Dolar, girtinin bêsûcane, pevçûn û teqîna makînak bara, "El'emşat" li Hemwelatiyên "Aşkê Xerbî" dixin da ku vêrgiyan werbigirin






















Li 22.11.2023an. Z, şandeke Hemahengiya Sûrî - Ixwanî seredana Efrînê kir, û di bersivdaneke serokê wê **"Hadî El'behre"** di hevdîtinekê de, bi "xelk û rûsipî û hevgirêdanên Herêma Efrînê" re, li ser pirsên taybet bi rewşên herêmê û belavbûna milîseyan û pêkanîna wan ji binpêkirinan re -li gor tiştê belavkirî û ji civatê bi dizî hatiye derketin- wî li xwe mikûr kiriye ku tu destlatiya "Hemahengiyê/I'tîlafê" li ser "milîseyên çekdar" tune ye, her yek ji wan girêdayî aliyeke derve ye, kêşe û pirsgirêk ji Hemahengiyê mezintir e, daxwaza bingehîn "kontirolkirina aramiyê û kokirina geregoşiyê" ye, û ew baceyan red dikin çimkî ne zagonî ne û nakevin xizmet cîbicîkirina pirojeyên geşepêdan û xizmetguzariya herêmê, û ew dengê xwe tevî yên daxwaza seknandina wan baceyan dike; Û sozek da ku wê binpêkirinan açiq bike û girînge yên dikin werin sezakirin/cezakirin.

**Ev jî hin kiryar û bûneyên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Revandina du sivîlan:**

Piştî şîva, li roja Pêncşemê 23.11.2023an. Z, giropeke çekdar bi saloneke "Van" rê li pêşiya makînak "Pîkab" (dora/50/teneke zêt /16/KG sade tê de) li seberjoriya/kaşê "Ermûtê/Riya Ekbezmeydanê - Reco" girt û sekinand, jê Hemwelatî ("**Munzêr Bîlal Birîmo** /25/sal" ji xelkê Gundê "Xilalka" - ajovanê makînê û di bazirganiya zêtê de kar dike, "**Ciwan Nîdal Hesen Kalo** /22/sal ji xelkê Bajaroka Reco - hevalrê") revandin, û endamekî din dest danî ser Pîkabê û ajot; Lê birayê "Munzêr" -li dema derbasbûna makîna zêtê di hundir Bajaroka Reco re- bi piroseya revandin û dizînê hesiya, û rabû "Ewlehiya/emniyeta Milîseyên Ehrar El'şerqiyê" agahdar kir, wê jî tu tiştek ji cî nelivand, û giropa ku piroseya revandinê kiriye bi herdu makînan /8/ rêbendên çekdar (Firqa nehan/çateriya Gundê "Maseka", Asayêşa Leşkerî/derbasgeh û derçûngeha Bajaroka "Reco", Firqit El'hemzat/çateriya Gundê "Berbenê", El'muntesêr Bîlah/çateriya Gundê "Hemşelekê", Mihemed El'fatêh/Çateriya G. "Ereba", Ehrar El'şerqiyê/çateriya Gundê "Emara", El'emşat/çateriya Bajaroka "Mabeta") bi hêsanî derbas kirin, di heman dema ku nasnamên makînên baran mekin têne hûnêrînkirin ger ku ajovanên wan Kurd bin; Lê makîna zêtê yekser piştî Çateriya Mabeta - bi aliyê Efrînê ve rastî bûyereke tirafîkê hat, û ajovanê wê yê çekdar reviya, û Makîna "Van" di pêşiyê de meşiya; Û ta niha çarenûsa yên hatine revandin nediyar e, û tirsek li ser jiyana wan heye.

**= Werza/mûsima zeytûna:**

**-** Serjimariya dawiyê ku ji Gundê "Kotana" de ji me re hatiye, dibêje ku "**Ednan El'xuweylêd/Welîd Ebû El'ize**" berpirsiyarê nivîsgeha abortiyê li ba Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" werza dora /10500/darî zeytûnê yên hemwelatiyên li derve ji xelkê gund qopirand, piştî ku hemî rengên rêdankan/wekaletan baykot kirin, û nirxa wan digihêje dora (/4/ hezar çiwal zeytûn = /5/hezar teneke zêt/16 KG sade = **dora nîv milyon Dolar**), û bê ku qirûşekî ji lêçûnên xizmetguzariya çandiniya du salan bide, ew ji bilî dizîn û vêrgiyên din ên li ser berhema zeviyên hemwelatiyên li wir ferzkirî.

**-** Pîştî berefkirina zeytûna, piraniya cotariyan dest bi kesaxiya daran dikin, lê bi ser ferzkirina wan ji vêrgiyên bilind re û destdanîna li ser gelek zeviyên zeytûna li (Bajaroka Reco û gundine pêve girêdayî û di ber Riya Efrînê - Reco re, ji çateriya Bajaroka "Mabeta" ve bigir ta çeteriya Gundê "Berbenê"), Milîseyên "**Ehrar El'şerqiyê**" her kesê dixwaze darên xwe bikesxînê neçar dike ku li nivîsgeha wan a li Gundê "Hecxelîl" - Navça Reco vegere û li ser vêrgiyeke nû **/5/ Perên Turk** -li ser her darekê- ferz dike bermberî ku karê xwe bike, û divê were zanîn ku "Ebû Teyma'i" li Bajaroka "Reco" berpirsiyarê nivîsgeha abortiya "Ehrar El'şerqiyê" ye).

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li 15.11.2023an. Z, "Dadgeha Efrînê" ya girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê sezayeke bêwijdan (**sê sal hepis û du hezar Dolar Emrîkî weke cezayeke diravî**) bi tuhmetên çêkirî derxist, li ser çar hemwelatiyên xelkê Bajaroka "Celemê" - Navça Cindirêsê, yên girtí di Hepsa Maratê ya navendî de, û ew jî ev in: ("**Mihemed Mistefa Binefşê** /30/sal, **Cim'e Mistefa Ewan** /27/sal" ji 24.7.2023an. Z ve, "**Cim'e Mihemed Kêlxelo** /28/sal, **Mistefa Mihemed Çolaq** /26/sal" ji 7.8.2023an. Z ve), û tê zanîn ku ew sivîl in û derbasî nav tu refên hêzên leşkerî yan ewlehiyê nebûne, li dema Rêvebiriya Xweser a berê (RX).

**Weha jî Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Ji bêtirî heyvekê ve, Hemwelatî "**Dilo Remedan Me'imo** /32/sal" ji xelkê Gundê "Upila" - Navça Bilbilê (ê ku di necariya girêdana bêtonê/banên avahiyan de kar dike), bi tuhmeta têkildariyê bi (RX) a berê re, û bo Navenda Efrînê hate şandin, û ta niha bêsûcane girtî ye.

**-** Li 21.11.2023an. Z, Hemwelatî "**Şewket Reşîd Eteş** /44/sal" û kurê wî "Reşîd/21/sal" ji xelkê Gundê "Şingêlê", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Bilbilê" ve, piştî basmîşkirina çend malan li gund, lê nikanîn hemwelatiyin din "Cemîl û Ehmed û Xelîl û Şe'iban - ji Malbata Eteş" bigirtana, ji nav wan hin berê jî hatibûn girtin; Lê me nikanî tuhmetên rûberî wan bûne nasbikira, û ta niha "Şewket" û kurê wî bêsûcane girtî ne, û berê jî "Şewket" şevekê zeviyeke xwe ye zeytûna pa -li vê werzê- û du rojan hate girtin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li şeva Înê 17.11.2023an. Z, pevçûnin di navbera du giropên (Gundê Qestelê Miqdêd, derbasgeha Bajaroka Bilbilê) ji Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad/giropa **Ednan El'xweylêd - Welîd Ebû El'ize"** de

derketin, bi sedema nelihevkirinê li ser zeviyên zeytûna yên dest danîne ser li Gundên "Elîcaro, Qornê, Gundê Kurdo..." û dizîn û vêrgiyên ku li ser werzên zeytûna - malmewdanên nişteciyên resen ferzkirî, û paşê jî li ser parvekirina paran li hev kirin.

**-** Li êvara Şemiyê 18.11.2023an. Z, bombeyeke teqîner di bin tirêla makînak bara de teqiya, dema ku gihîşte rêbendeke hevbeş e Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî û Asayêşa Sivîl li Efrînê" li derbasgeha bajêr a Rojhilat - Riya Ezazê, û di encamê de ziyanin şênberî çêbûn, û /19/kes jî -li gor berevaniya sivîl- cûrbecûr bi têvelî birîndar bûn, û rewşên metirsîdar jî di nav de hene.

**-** Li şeva 22-23.11.2023an. Z, dengê teqînina li hundir biryargeha -mala Dilovanber Mistefa Elûş- Milîseyên "**Firqit El'sultan Silêman Şah**" li Gundê "Aşkê Xerbî" - Navça Cindirêsê hate bihîstin, lê me çawabûn û encamên wan nasnekirin.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li Gundê "**Aşkê Xerbî**" - N. Cindirêsê, piştî ku Milîseyên "**Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat**" vêrgiyeke (5% li ser tevahiya berhema zêtê zeytûna) ferz kir, û xelk bi ferzkirina ("/20/Dolar Emrîkî li ser her dareke zeytûnê ye deştê û /5/Dolar li ser her dareke çiyayî -çi girtî yan negirtî- ji malmewdanên hemwelatiyên ne li wir", "/3.5/Dolar li ser her dareke deştê û nîv dolar jî li ser her dareke çiyayî -çi girtî yan negirtî- ji malmewdanên ên li wir") jî agahdar kir, li şeva Çarşemê 22.11.2023an. Z jî, wê piraniya malên xelkê basmîş kirin û gef dan wan û li piraniya mêrên ku hîn vêrgî nedane xistin; Û ta niha danesera/hemleya basmîşkirin û gefdanan berdewam in, û "El'emşat" rabûn hemî zevî serjimartin û hin jê jî bi rengekî nezagonî di nav rêdankên hin hemwelatiyên hene de tomar kirin.

**-** Li 18.11.2023an. Z, Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" rabûn Hemwelatî "**Hecî Hemkero kurê Hesen** /40/sal" û kurê wî yê negîhayî "**Hesen** /16/sal" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa çend katan di biryargeha xwe de bend kirin, gef dan wan û li pêş bavê mekin li kurê wî yê negîhayî "Hesen" xistin, piştî hatina girseyên xelkê li Mala "Hecî" li gund ji bo sersaxîkirina mirina xort "Ciwan Ebdo Hemkero" kurê birayê wî, yê ku li Kobaniyê bi bombebarankirina "dironeke kontirolkirî" li 16.11.2023an. Z pakrewan bûye, û "El'emşat" jî nehîştiye encûmena sersaxiyê jê re were lidarxistin.

Weke encamdan, xuya bû ku seredana "El'behre" û yên vê re ji Efrînê re, sûfetûçin û vala bûn, û nemaze ew xwe ji ber berpirsiyartiya di ber binpêkirin û tewanên riswabûyî yên ku li Efrînê dibin de didin yal/yan; Bi ser ku "Kiwalisyûn" xwe wek nûner ji rikberiya siyasî û çekdar re dibîne, nûnerên milîseyên çekdar jî di nav de hene, û "hikometeke demkî" ye wê heye, ye ku di nav xwe de şalyariya berevaniya "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" guncaw dike, ya ku hemî milîseyên çekdar pê ve girêdayî ne.

26.11.2023. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- "Hadî El'behre" di hevdîtineke Bajarê Efrînê de, 22.11.2023. Z.
- Herdu revandeyên Kurd "Munzir Bîlal Birîmo, Ciwan Nîdal Hesen Kalo".
- "Ebû Teyma'i" berpirsiyarê nivîsgeha abortiyê ya Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê", li Bajaroka Reco.
- "Ednan El'xiweylêd/Welîd Ebû El'ize" berpirsiyarê nivîsgeha abortiyê li ba Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad".
- Teqîna teqîneyeke bombekirî di bin tirêla makînak bara de, li dema ku di rêbenda çekdar a li Derbasgeha Efrînê ya Rojhilat re - riya Ezazê derbas dibû.
- "Mihemed Casêm/Ebû Emşe" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" li gel "Hisên Hemadê - şalyarê berevaniyê li ba Hikometa Sûrî ya Demkî".